Dumahîk: Roja jina.....

Ev ton bawerî û pêdariya wê , bi doz û netewa kurd dikir ku , ew bi jîrekî di nava partî de çalakiyên balkêş bike . Vêca jî , ew ji hêla rijûma bêbexit û dîkitetor ya **Bexdê** ve berçav dibe .

Piştî lihevhatina destgîrên Îraq û Îranê, li gora peymana di -6- Avdarê ,sala -1975an de, li ceza'îrê di nava herdu karbidestên xwînvexwer de hatiye girêdan , şoreşa kurdistana Îraqê têkçû !.

Wisan jî , Leyla leheng û sê hevrên wê, têne girtin û wan davêjin binê hebis û zîndana Ebo xirêb,di -13- î-5- an sala -1975- an hatin darvekirin û bi serbilindî , ew di nava karwanên cangoriyan de cîheyekî bêlikirî girtin . Hêjayî gotinê ye ku, **Leyla** nemir , di sala -1951-an de, li bajarê xanqînê , ji dayîka xwe bûye û ew weke xwendekareke sala çaran ji beşî sosyolociyê bû.

Beşdarên hêja û delal !

Bê gûman **Leyla Qasêm** , bi şahinazî ji gelê kurd re , nemaze ji jina kud re îro bûye sambûla pêdarî û serxwebûnê . Lewre jî , em ji hêla xwe ve, weke rêxistineka jina kurd ya parta Yekîtî , li bajarê Helebê ,roja -13- gulanê , roja darvekirina **Leyla** û sê hevalan ve pêşniyar dikin ku, bibe roja jina kurd li sûriyê û daxwez û merema me ew e ku , tevgera kurdî li Sûriyê xwedî li vê rojê derkeve û her sal di vê rojê de, çalakiyên taybet li ser rewşa jina kurd werine li dar xistin , ta ku em jin û mêr bi hevdu re karibin heyameke xweş - tundurist avabikin , civaka kurd bajone ser tiştine îjdil û dûrketin ji hevzîvirandin û hilpekirina di çîh de.

* - Rêz û silav li giyanê pakrewana gelê kurd **Leyla Hesen Qasêm** .

*- Silav li giynê nemirên -12ê Avdarê û hemû nemirên gelê kurd li çar peçên Kurdistan .

*- zor -zor sipas ji baş guhdariya we tevan re .

****

Dumahêk:Bîranîna..... *Ibrahîm El yûsif:*

(Piştî 108 salan ji derçûna yekemîn rojnama kurdî, tê xuyakirin ku wan di wê demê de zanîbû, rojname tiştekî giring û pêwist e, ew jî ne kêmî tivingê ye. Her dem û gav karên mezin li benda rewşenbîran e. Weke mînak, di bûyerên 12 ê Avdarê de, rewşenbîrên kurd karîbûn dengê gelê xwe bighînin raya gişti ya cîhanê. Lê, mixabin, rijêma Sûriyê gelek ji wan girtin û zindan kirin.)

Azad Ehmed Elî: (Bi derçûna yekemîn rojnameya kurdî, dîroka çanda kurdî nû dest pê kiriye, ew jî li cem kurdan mêraniyeke mezin e, rojname di ber mafê gelê kurd de serî hilda ye, Di nerîna min de, pêwistî bi derçûna rojname û kovarên serbixwe heye, da ku ji bin siha partiyan derkeve, ji ber pirengî ji civaka me re pêwist e; Dawî, silavên germ ji weşana Newroz re.)

Ednan Beşîr*: (Rojnamevaniya kurdî berî damezirandina tevgera siyasî bi 50 salî ronahî dîtiye, mûm li pêş gelê me pêxistiye, raman û hestên wî zengîn kiriye. Rojnama kurdî negihiştiye asta rojnama cîhanê, lê ew pêş ve diçe.)*